’Temefa Qey’ser û Kîsra kû peyama te didî
Sernigûn hatin û bê minnet û ’aciz ’temefa

Me’tefa aşê me gêrayî di fikra teme can
Can û ru’h herdû fîdayê tene bêmiz ’temefa

’Temefa ’îzzet û qedirê me bi ’işqa te giha
Di dinêda me çi ’hacet be mû’ezzez ’temefa

Me’tefa ’zahir û ba’tin ji te Nûrî fet’h kir
Ji cemalate û qedda teye nêrgiz ’temefa.

---

***Meşam: bênkirin, bêhnkirin, bihênkirin, (el-şem).***
***Kund: ’sem’xek e bi dara kundirê hindî digire. (’semi’x: hêlim, çirîş, cewî).***
***Bêmiz: bê kirê, belaş, bê îcar.***

(**1**)Şêx Memdû’hê Birîfkanî di destxeta xweda ev rêz bi awayekî din jî nivîsandîye: ”’Temefa lalî kirim ger çi dilê di pir ’xem bûm”.

Di vê helbestê da Şêx Nûreddînî mebest ji peyva ”`Temefa” yan ”Me`tafa” ewê digehîne ku (Fatîme el Zehrai el Betûl ) be, lê li gor daxwaz yên wî pêk naîne, li wê diçe kû mebesta wî Xudayê mezin be.

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:54 PM Page 46

**Mî’sba’h û çira**

Çi ’eceb ger ji te mî’sba’h û çira
Bi’sûjin! mislê me erwa’he çira(**1**)

Eve miskê te ebeq da li dinê
Li heme ’alemê feyya’h û çira

Ahê alale û cinsirî û binefş
Ji fîraqa tene renna’h û çira

Tuyî zîndayî tu bi destê qidret
Bi yeqîn xaliqê esba’h û çira

Li dilê ’aşiqî fetta’hî tûyî
Me nema ’hacetê mîfta’h û çira

Kerem û lu’tf û nîgarate qedîm
Ji ezel behre û menna’h û çira

Li be’hir belkî li ’Umman û zemîn
Qûwwetê her ’hût û tîmsa’h û çira

Ji te tewfîq geha Xezrec û Ews
Rewşinayî ji te î’sla’h û çira

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:54 PM Page 47

Her ji hingê kû bi çavan me tu dî
Her dibînim rû'h û eşba'h û çira

Destê xû bane se'her dame medam
Badîya qurmiz û 'eqda'h û çira

Lê hizar tîrê bi qewsên di helek
Dane cergê me bi erma'h û çira

(We remanî bînîşabîn we bînarr)
Şu'ileyê 'xemzeû remma'h û çira

Wekî Men'sûrî bi şe't'hêkê kû kûştî
Ji hewaya te me şe'ta'h û çira

(Bîfîraqîn we bîweslîn denefîn)
(We îza la'he newa 'ta'h) û çira

Tûyî Leyla û bi xû Qeys ezim
Mehê taban mehê seya'h û çira

Qu'tb û 'xewsîn ji cemalateyî mest
Destî ez 'husnate berra'h û çira

(Qe'te'el 'llahû bîmî'sba'hîkûmû)
('Hecebel qewmû bînî'sba'h) û çira

Sermiyanî heme'arifî nûrî
Wekû min dî ji te efra'h û çira

Ger xeberdit ji dinê Îtûtî
Dê kitin şuhreê î'za'h û çira

Lê li meydanê çû xeyyalî neman
Bi demê sebqeyê cemma'h û çira

Bi zibanê te Birîfkî we dibê
Lew geha me'idenê îf'sa'h û çira

---

***Alale: helale, alal (guleke bêhnxweş û pel sûr e).***
***Rewşinayî: rûnahî, rûnakî.***
***Badî: bade, pîyala*** meyvexwarinê***, pîyaley meyxwerin.***
***Şe'ta'h: (şe'ti'h: axiftinên sûfîyan kû li halê cezbê da dibên, wek*** *{Enal'heqqî Mensûrê 'Hellac})****.***
***Mehê taban: mahê taban.***
***Birîfkî: Mebesta şa`irî navê wî bi xwe ye. Herweha di gelek helbestan da naznavê xwe yê ş`irî bi "Nûrî" jî kirîye.***

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:54 PM Page 49

**Tîra qecer**

Ey mûrşidê wek îlîya, deryayê cehwer danera
Wî perwerê geylanîya, salarê der meyxanera

Dergeh li meyxanê vekir, bendek ji fincanê vekir
Dilber bi dildanî vekir, benda dilî mestanera

Mestaneyê rewşandilîn, ferxunde mislê bilbilîn
'Heyranî qulfa kilkilîn, çeşmê sîyah mûjganera

'Heyranî serwa qeddêwê, bûtxaneyê pir çengî mey
Dil her emanet danedey, ba simbilek sêwanera

Ew simbila 'eqreb 'sîfet, bêhûde dil epter diket
Sed kêrî bûrran lêdet, bêhiş diket dêwanera

Ma darê bedrê girtî 'sef, sed encûma her çar 'teref
Nageh dilê 'aşiq bi xef, min dî nûha bûtxanera

'Xaret ji dil kir 'acekî, ixsîr dikir taracekî
'Xunçek ji nik 'xûnnacekî, cerg û dilê bêganera

Cûrî medî weqtê se'her, 'zahir nemabûn sor û zer
Bişkeftin lê ji lebguher, şîrîn nîgeh durdanera

Zincîrê benda silsilîn, girdane le'ila filfilîn
Banî 'saba'hê sûnbilîn, 'tari dikin reşxanera

Nûrî ji qewsan da xeber, lew her dibarin lê ciger
Xun xun dikir tîra qecer, qet lê nema rey'hanera

***Îlîya: Îşaret e bo feylesofê Ilyayî li Yûnana kevin da.***
***Ferxûnde: pîroz, şad***
***Kêrî bûrran: kêra tîj, kêra birr.***
***Şîrîn nîgeh: be ciwanî seyrkirdin***
***mûjgan: birû, ebrû, birî***

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:54 PM Page 50

**Her kuca** (*)

Her kuca ha’zir bibim, ha’zir tûyî lê her kuca
Min fela’hek dî ji nesrîna meya ’er’er kuca

Rojî tabanim helê derya dilî nîlûferîn
Afitabê asimanê derya û nîlûfer kuca

’Husn û zatê ’heq bi teqwîm û cemala dilfirûz
Dilgûşabit mehweşa sîmasemen zîwer kuca

Serhemî mûnqadê fermanin di fikra xidmetê
Her tenê ferman bikin şeh Qey’ser û kîşwer kuca

Er ji bin benda nîqabê misk bû kakûl ’herîr
Şemmeyek rabî ji mûya ejdeha ’ember kuca

Ya bibînim fir’seta dînê mûbarek bit wî’sal
’Umrê ’safî xoş didêrim ’umrê Îskender kuca

Ya bi mihmanî bixûnin ber şûbak û penceran
Qet nema êdî bizanin derçe û pencer kuca

Ya ji gul nesrînê qedda nêrgizîn bit aşikar
Meh temam û serû qamet xûbî û esmer kuca

Ya ji ’uryanî cewabek bêt û Leyla de’iweket
Dê li ser çavan biçim Qeysê ji dil ebter kuca

Ya ji qewsê reş keman û ’iqdê perwîna helî
’Alemek enwer bitin, bes kesk û sor û zer kuca

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:54 PM Page 51

Yan berî afaqê ’zulmet rabitin weqtê se’her
Meh tecalla det dinê mahê temam eqmer kuca

Heybetek min dî ji bû çeşmê ’xezenfer awirî
Hûşiyarî min nema, heybet ji bû Qey’ser kuca

Menşeê fey’za ’terîqê min bi adabî te dî
Bê riya’zet ’heyderîn, ’alîhîmem qenber kuca

Dawirê eflak û neh çerxa (bîte’hqîqûlyeqîn)
Şemmeya lu’tfa te naê Dawûd û xawer kuca

Xawera Nûrî se’adet ji nemaê sed eman
M’edenê fe’zla îlahû lu’tfê pê’xember kuca

---

***Her kuca: her cihê, her derê, her şûnê.***
***Dilfirûz: dilronakerewe, dilveker, dilronak.***
***Zîwer: xişlê jina, xişrê jina, xişlê jinan.***
***Misk: bêhneke xweş e ji navka xezalan dertînin.***
***Kakûl: perçem, pêşenîk, tûncik, temberî.***
***Serû: dara serû, sewil, darî serû.***
***Ebter: bê paşîne, bê zuryet, kurkem.***

(*) Ev helbeste amaje ye be bê nirxbûnî hemû yarmetî û dîyade û cuwanêk le beramber nîwenigayêkî perwerdigarewe, û emeş ru`hî `îrfan e.

Mamosta Dr. Huseyn Xelîqî dibêt ev cara yekê ye kesekî xudan rêbazekê `îrfanî bi vê bawerîya mezin bi Xwedê perwerdîgar heye dibînim. Dîyar e ku Şêx Nûreddîn bi gewherê `îrfanê gehiştîye.

**Merqedê Nûrî** (*)

Haîmê dêr û bîyaban û sera
Qîblegaha dilê her mu'itebera

('Elemûl seyfî lehû fî yedîhî)
(Ehûwel şamsû leza'xel be'sera)

(Hederel qehrû bîhî mûnkerûhû)
(Hûwe mehrîqû dîmaîl kîbera)

('Xeseqel leylû îza qabelehû)
(Bîmesabî'hîn mû'hîya zehera)

(Webîmewlahû yûasîl berede)
(Îne men 'anedehû qed fecera)

(We îza cae bîma 'hawellahû)
(Ne'zeren be'sraûn xebera)

(Mûqtebîsûn bîqîyasîn wete'î)
(Eyûhel naqîdû fîma ne'zera)

Çil û çilxane 'tawandin çû kelîm
(Eyûhel mux'tîû fîmaxtebera)

(Hûwe fî kenzî qubabîn we'ela)
(Seqefel 'îzû weqed zale mera)

(We bînaeyn we 'zîyaeynî'ecîbeynî cera)
(Bîcemalîn wecelalîn wesera)

(Wekeremîl ’alemî eq’sa bî’e’sa)
(Efela yehcûrûhû ’teyfû kera)

(Wellahûl ’su’hbû bîxûldîn wene’îm)
(Webîhîl mûnkerû ye’sla seqera)

(Derecatûn we’eleyha besemû)
(Derekatûn hûwe fîhaiktesera)

(’Hesbîye’llahû fela yûxlîfenî)
(We enal naqîlû ’enhûl xebera)

(We lîsanî we cînanî hûwe fî)
(Xulleda mal de’eya mûqtedera)

(We îzal qelbû bîrebbî ’zefera)
(Eyû şeyîn febîhî ma ’zefera)

(Keremû’llahî leqed ’helle bîhî)
(Ha hûna bel weîza ’helle şera)

(We îza qe’sa ’eleykûm cûmelen)
(Efela ye’izerû fîma’itezera)

(Şe’xefel qelbû leqed e’hreqehû)
(Cemerrel ’hubbû lîza ma’s’tebera)

Kû li dilda heye ateş zedeneş
Bigehîtin di dilîda (cemera)

Nîye ’hacet te bi vê qi’seyî zor
Were jê bikre cewahir guhera

'Hikmetê herdu cîhan tê hene pir
Veke bû tecrîbe yek dû se'tera

(Hûwe mektûbûn wema ferre'te fî)
('Huk'mûhû îlla wefîhî iste'tera)

Were ser merqedê Nûrî û bibîn
Çi me'sabî'hû mefatî'he çira

---

***Bîyaban: 'se'hra, 'se'hrai.***
***Kelîm: bi axiftin, îşaret e bû Pêxember Mûsay dema li çîyayê Sîna bi Xwedê ra axift.***
***Ateşzeden: agir tê berdan.***
***Cemir: pel, polo, pelên agirî. Îşaret e bû Pêxember Mûsay dema li çîyayê Sîna xwest pelekê bîne.***

(*) Ev rêzên helbestê yên kû di nav kivanan dane, bi zimanê erebî ne û rêzên bê kivan bi zimanê kurdî ne.

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:54 PM Page 55

**Dilberek**

Herçê bibînît dilberek, lazim dikêşîtin cefa
Er qet nebîtin esmerek, nagehîte zewq û ’sefa

Zewq û ’sefa û nef’û ’zer, cewr û cefa û xêr û şer
Gerdan dibin enya qemer, wan mehweşa nînin wefa

Paş kû bi benda mu’hbetê, dil kefte be’hra mî’hnetê
Yareb ji ’eynî re’hmetê, derdê me derman bit şîfa

Ezman ji me lal bû ji ber, cewra ’hebîba sîmber
Ebrû hîlala rû qemer, derdil cemandin pir cefa

Dîsa pêşîmanîn bixef, min dil kû da ber sed kelef
Gîsû sîyeh enya ’sedef, şemsa dicarî bêxefa

’Sed naleû û firyad û ah, wê tên ji dil bê îştîbah
Yareb tûyî Nûrî penah, yareb bi ’heqqê Mûs’tefa.

---

***Mehweş: kesê ciwan, wek heyvê (hîvê), kesekî ciwan wek mang.***
***Gerdan: şitêk desûrêtewe, tiştek li dûr xwe dizivire.***
***Sîmber: laş zîv, leş zêwîn, peyker zêwîn, kesek kû laşê wî bi zîvî diçe, kesêk keleşî le zêw deçê.***
***Gîsû: bisk, zulf.***
***Sîyeh: sîyah (farisî) reş.***

**Feqîrê pir xe'ta**

Min feqîrê pur xe'ta, mu'htacî î'hsanê xuda
Bê meded ez 'xeyrî 'heq, firyad û 'xufranê xuda

Roj û şev bûrîn li min, herdem di çaha 'xefletê
Dê çikim asême lê, mecbûrî fermanê xuda

Dil qesawet ten peristim, sed eman ey re'hminak
Belkî lu'tfek bêt ji bû min, paşî 'u'syanê xuda

Keftî û bîmar û rencûrim, ji kê kem (kulleha)
Dê bibînim çarekê, bû derd û dermanê xuda

E'hmedê muxtar û Mûsayê kelîm û Cibreîl
Kem wesîlet wan ji xûra, cumle mestanê xuda

Gebr û Tersa û Fereng û Turk û E'irab û 'Ecem
Rûzewarin 'xemguzarî lu'tfê sul'tanê xuda

Cumleyê pê'xemberan û pîr û şêxê 'alemê
Bextîyarî qu'tbê weqtî pîrê geylanê xuda

Şafîyê derdê seqîmê pak Eyyûbê 'hekîm
Saqîyê cama xuda, Ye'iqûb Ken'anê xuda

Em nedîmîn pur nedamet 'talibê cama teyîn
Dê binûşîtin şerabê, dil ji fincanê xuda

Ne di dil 'safî û pakîn, ne 'îbadet pur dikeyn
Lê tinê nûrek heye, îslam û îmanê xuda

Ger bi giryanim ji derdê xû û ger me'hzûnim ez
Nîne ageh kes ji min, ey dilşikestanê xuda

Dadires ger lu'tfê 'heq Nûrî, nebîtin 'xemrevîn
Dê çi hîvî kim ezê mehcûrî î'hsanê xuda

---

***Çah: çal, bîr, qûlke.***
***Ten: leş, laş.***
***Re'hminak: bi re'him, be re'him, be bezeyî.***
***Gebir: gawir.***
***Tersa: feleh, file, fileh, mesî'hî, ni'sranî.***
***Rûzewar: dibe kû ev peyv rûzedar be (rûzedar: bi rojî, berojû, 'saîm).***
***Dadires: kesê dadger, kesê dadgerî, ew kesey ke le dad epirsê.***
***Gebir û tersa: Îşaret e bû helbesteka Se`hdî Şîrazî.***

**Rebbena**

(Rebbena bîîsmîke bîsmîllah sûmmel Mû's'tefa)
(Seyidel kewneynî men ercû bîhî 'halel 'sefa)

**{Rebbena pes ba 'Elî an kanê deryayê 'ulûm}**
**{Ankê pes E'hmed guzer bûrdî 'terîqeş ba wefa}**

**{Rebbena dîger bi îsmê tu kî re'hman û re'hîm}**(1)
**{Pes bi ba'srî an 'Hesen qu'tbê cihaniş bî xefa}**

(Rebbena ya malîkel emlakî bîlşeyxîl 'hebîb)
(Seyidel e'icamî feemla lîye kuûsen qerqefa)

Rebbena hatim bi dergahê te ey rebbê selam
Hem tu quddûsî bi 'heqqê pîrê 'Taî (muqtefa)

Rebbena muimîn tûyî sul'tanê kerxê vî demî
Min bi wî qe'sda teye eymen bikî min le cefa

(Rebbena entel mûheymin ya reqîben fîl 'îbad)
(Fe'ifû bîlsuqtîyî 'ebden mûznîben ya men 'efa)

Rebbena hatim bian sul'tanê Be'xdadê cuneyd
Hem bi ismê tey 'ezîz **{în bende dêh rebbem şîfa}**

(Rebbena cebbarena fecbûr lena kesren bîmen)
(Kane mecbûren bîkel şîblîyû 'hetta **{în 'sefa}**)

Rebbena lu'tfate bê'hed dîme ehlê kîbrîyai
(Kûn lena bîlqu'tubî wel şeyxîl temîmî mûlqefa)

(Rebbena 'ze'i lî bîe'ilal xuldî rebben xaîfen)
('Înde 'tersûsîna(*), e'ila meqamen refrefa)

(Rebbena ya barîyen sûila bî 'hekarîna)
Bû Mu'hemmed an 'Elî (kûn lî 'hesîben qed kefa)

(Rebbena îsmûn mû'sewer) paşî sul'tan bû se'îd
**{În heme awerdîm}** (kefîr lî 'ebdîn ma hefa)

(Rebbena 'xefarena bîl'xewsî 'Ebdûlqadirî)
(La tû'aqîbna îza qûmna meqamen 'sef'sefa)

(Rebbena nercûke bîîbnîl şeyxî ya qeharena)
(Mîn sûlalatîl 'sefa 'Ebdûl'ezîzîl Mû's'tefa)

**{Rebbena în bendera ba 'heqqê ferzendeş nûmay}**
**{Pîrî hetta giş Mû'hemmed cadeyê 'sîdq û 'sefa}**

(Rebbena wehabena rezaqena feta'hena)
(Bîîbnîhîl me'irûfî Şemseddîn nebehhe men 'xefa)

(Rebbena entel lezî 'ellemte kûllen ya 'elîm)
**{Ba Şerafdînî kê şûd ferzendê an behrê wefa}**

(Rebbena 'ellîm lena ya ba'sî'tel erzaqî mîn)
('Ilmîkel feya'zî fî îşrafî qewmî e'hrûfa)

(Rebbena zeyin fûadî bîlhûda ya qabî'zû)
(Heb bêzeyneddînê **{ferzendeş}** 'terîqen el'tefa)

(Rebbena kun lî 'ela reisîl me'alî rafî'en)
(Xafî'zel e'idaî weîn kûnna bîhîm Mûste'z'efa)

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:54 PM Page 60

(Rebbena wec'el Welîyeldîne {**ferzendeş lena**})
(Ya mû`îzzî fewqe merkûbîl meraqî murdîfen)

(Ya mûzîllen kaîden lî ew 'edûwen mûrcefa)
(Rebbena bîlşeyxî Nûreldîn {**ferzendeş ezel**})

**{Rebbena pes ba Hûsameddînê pakeş, hem pes}**
(Ya semî'en lîldu'aî e'l'tîf bî'ebdîn mûsrîfa)

**{Rebbena dîger bê ferzendeş kê Ye'hya namê şûd}**
(Ya be'sîrin 'îndehû 'zû'ifa we zekka maixtefa)

**{Rebbena ba nû'tfeyê pakeş Ebûbekirê şerîf}**
(Ente ya nî'imel 'hekem ya 'edlû aminû xaîfen)

**{Rebbena dîger bê 'Usman 'terîqeş ey le'tîf}**
(Ya xebîren ente men zexertehû lî Mûs'efa)

**{Rebbena dîger bê alûsî Ebûbekirê 'efîf}**
(Ya 'e'zîmen 'hulmûhû eskînnî qelben wacîfen)

(Rebbena bîlşeyxî Me'hmûdel Celîlî şêyxena)
(Ya 'xefûren ma beda mînnî bîcehlîn muxlîfa)

(Rebbena yercûke Nûreldînû bîlcem'îl kîram)
(We bîehlîl beytî wel e's'habî be'edel xûlefai)

(Rebbena bîllahî sîrrû'llahî me'inel'llahî fî)
(Mîm bî bîsmîllah wel 'tai qeble mîm be'ide fai)(**)

(Rebbena bîlnûrî nûrel nûrî me'inal nûrî men)
(Nûrûkel mî'sba'hû fî mîşkatî xeddey) 'Temefa (***)

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:54 PM Page 61

(Rebbena wextûm lena bîlxeyrî wel 'husna kema)
(Ûtîte eşyaxe zal miskînî qewmen şerefa)

(Rebbena wec'el 'se'late maleha 'he'srûn ebed)
(Be'ide teslîmîn 'ela 'Tehal 'hebîbîl Mû's'tefa)

---

Di nav vê helbestê da rêzên kû di nav kivanên bi vî awayîne (...) tê wê mena kû ew rêz bi zimanê erebîne, lê di nav kivanên bi vî awayî {...} û yên kû me bi 'hubrê reş çap kirîn, ew rêz bi zimanê farisîne. Û rêzên bê kivan bi zimanê kurdîne.

(**1**) Şêx Memdû'hê Birîfkanî li jûra vê rêza helbestê bi awayek din jî nivîsandîye û li hember nivîsandîye "nûsxe", tê wê mena kû di destxetek din da bi vî awayî bûye. Nivîsîye:
*Rebbena barî dikir ba ismê re'hman û re'hîm.*

(*)Ev peyva di nav vê rêza helbestê da em jê ne bawer bûn, belkî mebesta Şêx Memdû'hî dema kû nivîsayî ku ev peyv ('tûr sînai) bît. Lê nivîsandîye ('tersûsîna), me jî wek wî çap kir.

(**) Ev rêz mebest jê peyva `temefa ye, kû Xudayê mezin e.

(***) Peyva mişkat îşaret e bû ayeteka Qur`anê, hinek ji feylesofên îslamî yên kurda mîna Ibin-Sînai li gor wan weha ye kû ev ayete îşaret e bû pilekanên `eqlê nezerî.

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:54 PM Page 62

## Re'idê fîraq û 'hîrqetê

Re'idê fîraq û 'hîrqetê can û dilê merdanera
Abê rewan û berq ha barkirin bihanera

Bazî û mestîya dinê min di 'se'hîfîya te dî
'Hîkmetê 'xeb'xebê şekerxa di berit fisanera

Fisane qewsê kesk û zer, behane libsê zêwerî
Dawir û neqşê xawirî, bestîye ez kema nera

Be'hre beyadê 'husnê pir, lew bi ne'seq me dîtin dûrr
Sîneyê textê şeh li ser, cayîgeha te xanera

Dad û fî'xanê her kesê, sûzî gihande her 'teref
Belkî firûşte jê diçin, dad û ahê fî'xanera

Min ji cemal û pertewan girtîye mîrîya dinê
Kes nûhe lê nefişyarî canê qedîr cefanera

Nuq'teyê baê min kûdî, min ji xe'tê lu'acê dî
Camê cemû Sikenderî, nuqtegehû nişanera

Qudsî û jêr û jûrîyan, rû'hê emîn û 'hûrîyan
Simbil û ward û cûrîyan, baz û şibak û danera

Gûşeyê mahê newmera, 'xemze kujî bi dil ketin
Tîr û xedeng dane gîyan, xûş dikirin nihanera

Ger çi li jêrî çahî bûm, lê mekû gişte silsilîn
Destê giha me pîrê wan, cagehû aşîyanera

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:54 PM Page 63

Aynîya ’heqîqetê ger tu bi ’heqqî ’arifî
Wer tu bibîne ’sûretê aîneyê cihanera

Qencî bibîne ’sûretê nûsxeyê, ’heq nima kirî
Celweh bi keşf û pirtewin, sîmtena şebanera

Dil be birîn û ateşin, suxteyî gula geşin
Têkda nîgar û mehweşin, E’hmedî û kinanera

E’hmedî û Mu’hemmedî gûşenişînê sermedî
Min kû di sîlsîla te dî, ser çemîya kijanera

Çeşmê kivan û ’se’hnekî, ’se’h bikitin bi lewnekî
’Hukumê ezel di gel ebed, sertedinê kivanera

Ger ji dûcamê ser bi ser, zêr û nişan û sîm û zer
Yanî ji ’xûnceyê di ter, keşf bibin qesranera

Pîrê mû’xanî sûcdeyek lazime lê bi can û dil
Fûr’set û dewletek wedî, pîrê meyê mû’xanera

Ya ’eceben çi ’arifî nûrî pîrê me’arifî
Be’hr li ser tu waqifî, serkêş û ser mîyanera

Ya ’eceben çi aşiqî, kafir û dil mûnafiqî
Ger tu bi ’işqê ’sadiqî, xef meke ’aşqanera

Xef meke ’işqê sertemî, çêtire narê ce’hnemî
Da nemirîn di vî ’xemî, fîrqetî mehweşanera

Ger ji nîqab û bûrqe’ê, nûrî tecellayek bidit
Xi’zrî bi razî nûrîya, kamil û mûrşîdanera

*Berq ha: birîsî, birûske, birûsk.*
*Şekerxa: qisexûş, dem be qend.*
*Abê rewan: ava kû diçe, ava diçe, awî rewan.*
*Di berit: li beramber te, li himber te (qîyasen bîke).*
*Fisane: efsane, dastan*
*'Xeb'xeb: jêr erzênk, jêr çinake, xevxevk.*
*Behane: biyanû, bîyanûgirtin, pelp.*
*Zêwer: zêr û zîv, altûn û zîw.*
*Xawir: rojhelat, rojhelatî.*
*Pertew: rûnahî, tîşk, nûr.*
*Sikender: Îskender.*
*Şibak: tor, (şebeke), rayele*
*Pîrê mo'xan: pîrê Zerdeştî (mo'x: melayê zerdeştî).*
*Bûrqe`i: Cube, peşmîney balapûşî mirovî perhêzkar.*
*Mehweş: Wek hîvê, ciwan.*

**Selma**(*)

Me Selma her tinê dîbû ji xûbanê cihan Selma
Qesem ba wecihê Selmayê, tûyî yek ten 'eyan Selma

Dinasîn em te Selmayê, cihangîrê me yektayê
Ji dûnyayê ji 'uqbayê, 'eyan û hem nihan Selma

Di çeşman da yeqîn nûrî, tu da'xê can û rencûrî
Di Çîn da tu ji Fe'xfûrî, şahinşayê zeman Selma

Tû Leyla dilbera Qeysî, tu zayê sîneê deysî
Tivî rengî, tivî keysî, mirada her kesan Selma

Mirada mûslim û mûl'hid, çi der dêrê, çi der mescid
Neveftê her yekê mûrşid, şirîkê muşrikan Selma

Şirîkê mûşrikanî tû, emînê 'silabkanî tû
Meta'ê her dûkanî tû, dûkana cewheran Selma

Sizawar û keremdarî, li ser gencî tu her marî
Di gel Mûsa û se'harî, îmamê sa'hiran Selma

Ji deryayê dide mewcan, ji wê tên her dur û mercan
Tû dam û daneya her can, tûyî rû'h û rewan Selma

Tu şemsa kewkeba carî, felekgêrû û seyyarî
Di çerxa lewleba carî, di 'işqa te dayîn Selma

Ji ber 'işqa te bîxud bû, eger roj û eger şeb bû

Şibî me her tibê ew bû, hemû se'it û deman Selma

Çi b'nvîsim çi bêjim ez, qewî 'heyran û gêjim ez
Eger dînê ji mêjim ez, tura axir xudan Selma

Tûyî we'llah xudanê min, tûyî ru'h û rewanê min
Tûyî fe'sl û beyanê min, bikim be'hs û beyan Selma

Eger dilber bidit fûr'sed, mededkarê mebit ne'sret
Qelem dê be'hsekê jêket, ji şehzadê cihan Selma

Ji şehzada 'sîfet 'hûrî, 'hebîb û dilbera nûrî
Sîyeh çeşm û gula cûrî xudana erqiman Selma

---

***Fe'xfûr: şahê Çînê, şahî 'Sînîyekan.***
***Genc: xezîne, gencîne.***

(*)Ev helbesta Şêx Nûreddînê Birîfkanî di nav destxeta ku Şêx Memdû'hê Birîfkanî nivîsî, tunebû, me ji destxetek din dîtîye û nivîsîye.

Li vir beşek ji felsefê behs dike ew jî babeta dîyalektîk e:

**Têz, antîtez, sentêz.** Bo nimûne: danraw (têz), beranberdanraw (antî tez), berhemê herduyan (sentêz).

Nu`tfe( tuxm) a mêrî têz e, digel hêlka jinê ku antîtêz e, berhema herduyan ku zarok e, sentêz e. Şêx Nûreddîn dixwaze bêje ku Selma hem têz e, hem antîtêz e û hem jî sentêz e. Tê wê me`nayê dijîtî û beramber dijîtîyê gişt Selma bi xwe ye. (Yekbûnî bûn, an jî *Wehdetul Wicûd*)

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:54 PM Page 67

**Qelbê reqîb**(*)

Da qelbê reqîbî me şukir bûme sitemda
Der dîde sirişkû di dilî zêde elem da

Min gûtê çi ’hale, kû dê dey cewr û cefayê
Se’itê kû demê rûperî pê firqet û ’xem da

Firqet li me wek te’hle, keremke bide we’slê
We’slet kû neda, ze’hmet û pa bend û seqem da(**1**)

’Tebi’ê me nevêtin ji wî’sala te fîraqek
Tîrek ji kivanê qecerî bûme ’ecem da

’Hîkmet çîye nayê te xeyalê te ’xema min
Bû cehlê şeqî ’îzzet û ’în’amî ’hekem da

Pê pê digirit lu’tfê û b’min dil weh di’sûjî
Hadir kû wekî mahê kerem bûme ’elem da

Bismê te dixum sondê me dil pêt û pirrenge
Der sîneyê ateş kû lehîbê cigerm da

Çi dûrî di fîraqê dimeha xîz nimayî
Wi’llahî dizanî kû nîgarê çi kerem da

Şev çû medî necmayê si’ûda me helatin
Berdayî li me bext û xuda camê bi cem da

Îslamê kû pêwande dibûn weh weh digûtin
Hey hey ke çi îslame çi îmanû selem da

ÊË–«‰œÍÊ†‰« ÍÊÍ 20/7/02 3:54 PM Page 68

Hindî kû fere'hnak dibîn herwe dibêjin
Şêxê meyê Nûrî, beriqê bêdem û sem da

---

***Sirişk: rûndik, firmêsk, hêsir.***

***Seqem: dijwarî, sextî, bêberî.***

***Cam: camî cem (camî ke Şah Cemşîd hebûyî), şûşeya ku Şah Cemşîdî heyî.***

***Cem: Cemşîd, Şahê Îranê, Şahî Îran.***

***Tîrê qecerî: tîr û kemanê(kevan) qecerî. Qecer eşîretek tirk in li Îran.***

(*)Ev helbesta Şêx Nûreddînê Birîfkanî di nav destxeta ku Şêx Memdû'hê Birîfkanî nivîsî, tunebû, me ji destxetek din dîtîye û nivîsîye.

(**1**)Peyva "nenindeû" di nav vê rêza helbestê da baş nedihate xwendin. Dibe kû "nerindeû" be.

**Ra'heta herdu serayan**(*)

Ra'heta herdu serayan bi xudê min hene vêra
Çikû em pir nagehîn şukir û minet ji xwedêra

Ji 'xemîyakî çîye min kû dilê şade bi cana
Dil ke şadîn û fere'hnak û sirûrîn bi devêra

Çi kû em bade dinûşîn û bi 'eşqa te dimestîn
Ji sefergahê guneh, dilten û canbexş û vêkra

Dil û can herdû medan, bad û sîyeh ef'a dibexşîn
'Eceb em mest û xerabîn, ji evê sîmîn te nêra

Ji xuld kû dû cîhan, celwe û mîraate çi bêjim
Dil ji kê rabe pirî, sûcde û te'i'zîmî ji kêra

Be yeqîn Yûsifê Mi'srî û Zûleyxaya zemanî
'Alemê tin kû 'telebkare ji vê mu'hteşemêra

Kû Zuleyxa {bîtûnem} dil bi sitra Yûsifê ’Husnî
Kefte benda te û kêşan, gelekî ’xem bi ’xemêra

Her kesê ’talibê dîdarî bibit rû’hê bidet
Bi nisara qedema dilberê şeker şikenêra

Xurd û ’eqlê ji hingê, kû hewes bû di dil Nûrî
Be nemane wene rêtîne ji ava qendelêra

---

***Sîmîn: zîvîn, zêwîn.***
***Nisar: şabaş, bexşîn.***
***Şekir şiken: şekir şikên, kesê kû şekirê dişkêne. Mebest ciwanî û şirînî ye.***
***Xurd: ’eqil û hoş.***
***Hewes: îştîyaq, xerîbî.***

(*)Ev helbesta Şêx Nûreddînê Birîfkanî di nav destxeta ku Şêx Memdû’hê Birîfkanî nivîsî, tunebû, me ji destxetek din dîtîye û nivîsîye.